

Serkeftina ya gelê Kurd e

**AMED, bakûrê
Kurdistanê --
Hevserokê DTP'ê
Ahmet Turk** anî

ziman ku di
hîlbijartinên 29'ê
Adarê de gelê kurd
îradeya xwe daniye
holê û wiha got:
"Encamên hatine



bidestxistin polîtîkayên înkâr û îmhayê yê ji bo pîrsgirêka kurd pûç derxistine. Ji bo çareseriyê demokratîk û aştiyane fersendeke nû daniye holê. Hewldanên Serokwezîr Erdogan ên piştî 22'ê Tîrmehê Tirkiye ber mi qonaxê xeternak ve bir. Gelê me bersiva Hikûmeta AKP'ê da."

'Zagon bi cih neanîn'

Turk anî ziman ku gelê kurd di hîlbijartinên 22'ê Tîrmehê de bi hêviya çareserkirina pîrsgirêka kurd ligel DTP'ê şand da AKP'ê û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Min di nirxandina xwe ya piştî hîlbijartinên 22'ê tîrmehê de gotibû gelê kurd 'dengên xwe emanet' dan AKP'ê. Lê Hikûmeta AKP'ê ev dengên gelê kurd bi şert dabûn wan tune hesabandin. Bawer kir ku ew ê bi rêbazên şîdetê pîrsgirêka kurd çareser bikin. Divê bê dîtin ku van polîtîkayan îflas kiriye."

'Gel derst da îktîdarê'

Turk di axaftina xwe bal kişand ser helwesta waliyên li bajarên Kurdistanê peywîrdarin û anî ziman ku AKP'ê ligel rêberiyên xwe yê bajarên bi hevkarîya waliyan xwest gel bi alîkariyan bixapîne. Turk got divê walî bibin waliyên gel û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Piştî hîlbijartinên 22'ê tîrmehê waliyên herêmê wekî serokên bajarên ên AKP'ê tevgeriyan. Em bangî waliyan dikin ku bêyî ferqê bêxin nava gel ji

her kesê re xebatan pêk bînin. Îktîdar diguherin lê gel dimîne. Em li Mûş, Mêrdîn û Agiriyê bi rastî zextan hatin. Li Şirnexê polîsan bombeya gazê avêtin dibistana ku 25 sindoq lê bûn. Li Mêrdînê li hin dibistanan peywîrdarên me hatin dûrxistin û sindoq hatin revandin. Li Agiriyê heta vê saetê encamên hîlbijartinê nehatine aşkerakirin. Ev yek di hundirê gelê me de bûye sedemê gumanan. Li Tuzlucaya Qersê ligel ku hîlbijartin me bi dest xist, encameke cihe derxistin holê. Li Gimgima Mûşê alîgirên AKP'ê yên ku dît hîlbijartinê winda dikin êrîşî Serokê Giştî yê BDP'ê Demîr Çelîk kirin. Ew kêr kir. Ligel van pêkanînan hemûyan gelê me di sindoqan de dersa hêja daye îktîdarê."

'Me şaredariyên xwe ji 56'ê derxistin 98'an

Turk diyar kir ku ligel zora rayedarên cemaweriyê û îktîdarê li Mûş, Agirî, Bedlîs, Mêrdîn û Çewlikê gel piştgirê daye DTP'ê û wiha pê de çû: "Li van bajaran 4 hezar leşker û polîsan wekî blok dengên xwe dane AKP'ê. Yekemîn bûna me ya di hîlbijartinên Meclîsa Giştî ya Bajaran a li Mêrdîn, Mûş û Agiriyê vê rastiyê dide der. Hîlbijartinên 29'ê adarê îradebûna gelê me da der û hejmara şaredariyên me ji 56'ê derxistiye 98'an. Ev encam gelê me daniye holê. Gelê me pîroz dikim." Turk piştî pirsên rojnamegeran bersivandin. Turk anî ziman ku li Mêrdînê DTP'ê 12 hezar AKP'ê 14 hezar deng girtin û wiha pê de çû: "Polîs û leşkeran dengên xwe blok bi kar anîn. Dengên wekî blok hatine bikaranîn bandor li ser îradeya gel kir."

Baydemîr spasî kir

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî li ber avahiyê partiyê xîtabî girseya ku civiya bû kir û spasiyên xwe yên ji bo gel anîn ziman. Baydemîr wiha got: "Ev serkeftina we ye. Serkeftina me hemûyan e. Ji îro em ê destpêbikin ne 8 saetan 16 saetan em ê bixebitin. Û xizmetê ji bo gelê xwe bikin. Em çiqas bixebitin em ê xwe ji bo we deyndar bibînin. Em ê ji niha şûn de ji bo ku hêjayî gelê xwe bin, bixebitin."